Nordkurdiska
Ungdomar

Ciwan

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Kes na vêt ku ji bo jiyanek baş derfetên xirab li pêş wan hebin ji ber ku ew xort in. Xort divên – û mafê wan e jî, ku xwedî jiyanek baş û ewle bin. Ji ber vê yekê me Sosyaldemaokrat divê û pir grîng e, ku em xwedî ramyariyek ciwanan a herî zexm bin.

Î roj gelek ji ciwanan xwedî dijwariyên debar û jiyanê ne. Heger ciwan ni karibin xwandina perwerdeyî bibin serî, hingê ji wan re pir dijwar e, ku bibin xwedî kar. Bêkarmayin mejiyê wan tevlihev dike û ta mirov dikare ji ber vî derdî nexweş jî bikeve. Heger hatinek mirov ne be, mirov ni kare bibe xwedî mal. Em dixwazin li dij vê rewşê rawestin. Ji bo Swêdê qet ne baş e, heger ew hêza mazin, ku ciwan hene bi avê de here.

Tiştê herî grîng ew e, ku divê ciwan bi xwe di qada biryardayinê de beşdar bin. Em Sosyaldemokrat pir bi tundî dixebitin, ku gelek ciwan bikevin civatên biryardayinê. Ji bo bêhtirkirina beşdariya ciwanan, hikûmeta Sosyaldemokratan biryar girtiye, da ku li vê payizê, li tevayiya xwendegehên li welêt hilbijartinên xwendegehî (skolval) bibin.

Perwerde
Mafê perwerdeyê mafek bingehîn e. Me na vê ku kes bêyî xwandinê bibe serî dev ji lîseyê (gymnasiet) berde. Ji ber vê hindê xwendegeh derfet divên. Ew şagirdên ku di xwandina bernameya kesane (individuella program) de ne, ew dikarin vê xêzê rojane berdewam bikin. Ew bernameyên pîşesaziyê (yrkesförberedande program) yên li lîseyan, gerek baştir bibin. Em xwandinek nuh a ji bo şagirdiyê (lärlingsutbildning) didin destpêkirinê, ku ev dibe alîkar, ku mirov li jiyana xebatê jî bibe xwedî zanyariyan. Di ser de jî, her xwendakarên lîseyê mehê 100 kron bêhtir alîkariya

xwandinê (studiebidrag) diwergirin. Em xwandina bilind bi 17 500 ciyî bêhtir dikin, da ku pir kesên din bikaribin li xwandinên bilind (högskolan) derfeta xwandinê ji xwe re bibînin.

Xebat
Her mirovekî xwedî wî mafî ye, ku bibe xwedî karekî ku bikaribe bi wî karê xwe bijî. Î roj gelek ji ciwanan dihên li dervehiştin ji ber ku pir dijwar e ketina nav bazara xebatê. Ji ber vê yekê em li pey afirandina derfetên taybetmend in, ku ciwan bibin xwedî kar û xebatê. Çi ciwanek divêt ji 100 rojan dirêjtir bêkar ne mîne. Me piştgiriyek taybetmend a ji bo karwergirtina (anställningsstöd) ciwanên bêkar pêk haniye. Şaredarî berpirsiyarek diyar hene, ku li ser rewşa karwergirtina ciwanan hûr bibin û ji ciwanên bêkar re xebat û lebatê pêşkêş bikin. Avahiya Karpeydakirinê (Arbetsförmedlingen) dîrektîfan wergirtine, da ku êdî zûtir piştgiriya ciwanên bêkar bikin.

Xanenişîn
Pir ji ciwanan î roj xwedî gelek dijwariyan in, ku ji xwe re xaniyek peyda bikin. Divê ne bi vekirina devê kîsê mirov bibe xwedî xanî. Loma em dixebitin ku gelek xaniyên herzan ên kirê werin avavkirinê û xaniyên xwendevanan bila herzan bin daku xwendevan bikaribin lê rûnin. Yên xwedîxanî pir î caran gava xaniyê xwe didin kirê, xwedîxebatbûnê dixwazin ji xelkê û ev merc dibe asteng li ber ciwanan, ku ji xwe re bikaribin xaniyek kirê bikin. Bi riya piştgiriya dewletî em dixwazin ku şaredarî bibin wekîl, ku kiriya xanî bihêt dayin. Em li hevberî wê pêşniyarê ne, ku ji ciwanan re xaniyên nebaş û li şûnên nekêrhatî cibicî dikin.

Tendurustî û dema vala
Pir ji xortan di nav strêsê de ne. Nexweşiya derûnî her ku dihere bêhtir dibe. Ev piranî bi serê keçên xort dihê. Em Sosyaldemokrat dixwazin derfetên sexbêriya derûnî ya zaro- û xortan bêhtir bikin. Em dixwazin gelek malên ji bo dema vala (fritidsgårdar) û ciyên din ên kombûnê hebin, ku xort li wir demên watedar û xweş bibuhurînin. Her wisan jî em dixwazin derfetên ji bo xebata ji bo zexmkirina tendurustiya xwendekaran bêhtir bibe.

Alternatîva vê
Li hevberî vê ramyariya me, Moderat û hevbendiya (högerallians) baskê wan ê rastê dirawestin. Moderat dixwazin daxwaziyê daxînin û li xwendegehê zarokan li bêjingê bixînin. Ew dixwazin bernameya kesane ya lîseyê ji holê rakin û şagirdên 17-18 salî bêgav bimînin daku herin xwandina seretayî (grundskola) Moderat dixwazin karguzeriyên ji bo wan şagirdên ku dixwazin bernameyên pîşesaziyê bixwînin, daxînin. Moderat dixwazin ramyariya bazara xebatê xirabtir bikin û her bi vî awayî gelek xortan bêlebat û bêtevger bihêlin.

Partiya Center’ê pêşniyarê dike ku xortên temenê wan di bin 26’ê de, bikaribin derhal ji kar werin avêtinê. Li Frense gelek xort û kesên bi temen, li hevber vê pêşniyarê protest kirin. Her dîsan jî Partiya Center’ê dixwaze sîstemek welê li Swêdê jî pêk bihêne.

Bi vê ramyariya Moderatan, derfeta xortan ji bo ji xwe re peydakirina xaniyekî qet na mîne. Moderat dixwazin, ku piştgiriya dewletê ji bo bidestxistina xaniyên herzan ji bo xelkê û ji bo xwendekaran ji holê were rakirinê. Ew her wisan jî dixwazin alîkariya ji bo kirê (bostadsbidrag) ji bo kesên xort ên xwedîzaro di bin temenê 29 salan, were ji holê rakirinê. Ev tev derfetên ciwanan ji bo jiyanek serbixwe ji binî ve na hêle.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?